# Silavên ji bo Roja Berxwedana Gelên Xwecihî

Em baga Kongrea Netewî a Gelên Xwecihî ji bo Roja Berxwedan û Rûmeta Gelên Xwecihî silav dikin û hevgirtina xwe bi gelên Abya Yala û li tevahiya cîhanê yên li dijî mirina ku îro ji her demê zêdetir ji aliyê kapîtalîzma baviksalarî ve li ser me tê ferzkirin berxwedidin.

Beriya 531 sal roja 12'ê Cotmehê de, kolonîzekirina parzemîna Abya Yala dest pê kir û ev serdemek wêranker a îstîsmar û zordestiya ne tenê hember gelê xwecihî li Abya Yala lê li seranserê cîhanê destnîşan kir. Û ev siyaseta hegemonîk a dagirkeriyê ya dewletên kolonyalîst heta roja me ya îro jî didome. Çi bi şeklê şeran be, bi şêweyê koletiya nûjen ji aliyê şîrket û împaratoriyên aborî ve, diziya axê û wêrankirina jîngehê yan jî bi qirkirinên çandî, înkarkirina ziman û çanda gelê xwecihî û înkarkirina beşdariya siyasî û xwerêveberiyê. Rojane bi hezaran kes, jin û zarok dibin qurbaniyên vê sîstemê û bê navber şerê taybet û hovane ser wan tê meşandin. Ev mînakên pergala cîhanê ye ku li ser zihniyeta tinekirina îradeya jinê hat ava kirin û nîjadperestiyê gurr dike, nasnameya şexsî û kolektîf tepeser dike, çand û ehlaqa civakî ji holê radike.

Bêgûman bersiva yekane berxwedan, hişyarbûn, birêxistinkirina gel û di serî de jî têkoşîna jinê ye. Û ji ber vê yekê 12'ê Cotmehê ye. weke rojekê girîng e, ne tenê weke destpêka dagirkirina parzemînê, beriya her tiştî ji ber ku destpêka berxwedana li dijî wê ye. Berxwedana birêxistinkirî ya gelên ku li hemberî tundî û zordarî, kolonyalîzm û qedexeyên rejîmên îstîsmarê bêdeng namînin, teslîm nabin û wan red dikin, misogeriya edalet, demokrasî û azadiya hemû gelan e.

Em weke tevgera Kongra Star ku li Rojava û Sûriyê ji bo azadiyê têdikoşin êşên girêdayî dagirkeriya li ser axa xwe, windakirina dîrok, ziman û kevneşopiyên xwe naz dikin û em hêza û giringiya berxwedanê ya rêxistinkirî dizanin. Bi salan e em weke jin li vê derê li Kurdistan û Rojhilata Navîn ji bo azadiya xwe û azadiya ax û civaka xwe têdikoşin.

Di têkoşîn û berxwedana xwe de em xwe bi hemû gelên bindest ên cîhanê û bi hemû gel û jinên berxwedêr ve girêdayî hîs dikin. Em ku bi taybetî bi civak û axa xwe ve girêdayî ne, di têkoşîna azadiya gelên xwe de pêşeng in. Bi vê mabestm em îro girêdanbûna xwe û hevgirtina xwe ya bi berxwedana gelên xwecihî re radigihînin û bi taybet hemû jinên têkoşer silav dikin.

Jin Jiyan Azadî !
Berxwedan Jiyan e!

Kongra Star
12'ê Cotmeha 2023